# Newroz



**Dr Nûredîn Zaza**
*1919- 1988*



**Osman Sebrî**
*1905 - 1993*

*Xebat ji bo* : * **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .**
* **Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .**

***Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*** - **YEKÎTÎ**

***Hejmar (104-105 ) sal 18 Êlûn 2012 z - 2624 k Buha ( 15 )ps***


# Avabûna yekitiyê mizgîniyek e

Rojnameya Nweroz ya li Kurdstana Turkiyê bi zimanê Turkî û Kurmancî derdikeve, di hejmara xwe ya 221 an de, , hevpeyvînek bi sekretêrê PYDKS û endamê Desteya Bilind a Kurd re çêkiribû. Emê ji xwendevanên xwe re wê biweşînin.



***Mihyedîn Şêx Allî,*** *Sekreterê Giştî yê PYDKS, yek ji danerên Encûmena Niştimanî ya Kurd Li Sûriyê û endamekî Desteya Bilind a Kurd e. Jidayikbûn li bajarê Efrînê, sala 1953-an e. Ji sala 1968-an ve derbasî kar û xebata rewşenbîrî û siyasî, bona Kurdperestî û mirovheziyê bûye. Piştî rêkeftina 11-ê Avdara 1970 ,di navbera şoreşa Kurdî û Bexdayê de, ji nav xwendekarên Kurd li Helebê hatibû hilbijartin û li kongira yekemîn yê partiyê yê ku li Kurdistana Îraqê hatibû lidarxistin beşdar bû. Li ser rewşa Sûriyê û Kurdistana Rojava, me ji bo Rojnama Newrozê bi Mihyedîn Şêx Alî re hevpeyvîn çêkir.*

*- Pêşî, hûn dikarin xwe û partiya xwe ji bo xwendevanan bidin nasîn?*

- Navê partiya me Partiya Yekitî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (PYDKS-Yekitî) ye. Di nav gelê Kurd û raya giştî ya Sûriyê de bi van çend **D.R. ( 11 )**


**Vekirina Navendan** — **3**
**Nweroz**

**Gilî û gazinên Zarokekî** — **4**
**Enehîte Murad**

**CEBRAÎL** — **6**
**Kovara Ronahî**

**Kurmê darê ji darê ye!!** — **9**
**Rêberê Silîvî**


*Email : Newroz 95 @ hotmail . com*

www.arsivakurdi.org

**Nûçe û Çalakî**

# Giropa Girava Birçîbûnê

Em di giava birçîbûne de ne ta geşkirina biryarên Desteya Kurd ya bilind li ser erdê. Û banga wan ev bû :

**Bang ji hemî berketiyên gelê Kurd re**

Bi navê girûpa ku ketine girava birçîbûnê, ta bicî anîna biryarên Desteya Kurd a Bilind, Liser erdê em bang li hemî berketiyên gelê Kurd dikin, û bi taybetî Encûmena gel a Rojavayî Kurdistanê, Encûmena Nîştîmanî ya Kurd li Sûriyê, Serok Mesûd kurê Barzaniyê nemir, serok APO- yê ku , azadiya xwe ya kesane diyarî gelê xwe kiriye, û rêvebiriya Qendîlê ya têkoşer , ku hewildanên xwe bikin , ku bi hemî şêweyan kanînên xwe di xizmet geşkirina D.K.B kin ,da ku biryarên ku li Erbîlê li ser li hev kirine, li ser rûyê erdê bi cî werin, û gelê me yê Kurd pê Şa bibe.

Ji ber ku, em bawerin, ku D.K.B tenê wê gelê me bighîne delavê ,

Aştî, Azadî, Wekhevî û asayiyê.

**Em bi hêvî û lavelavin, ku zû daxwaza me pêk were , ji ber ku em ji jiyanê hezdikin.**

**Dîrok:6.9.2012 Z - 2624 K Kat : 8 ê êvarî**

**Li 19-9-2012, li navenda E.N.K.S li bajarê Heleb bi beşdariya hin Kurdhez û partîzanan , ew girop ji girava xwe derket. Ji ber ku nameya wan xwestibû gihaye milet û D.K.B ji berê bêtir xwe daye pêkanîna biryarên xwe.**



**Nûçe û Çalakî**

## Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê , di derhênerkirina korsên zimanê Kurdî de berdewam e.

* S .F . P . Z . K S, li bajarê Qamişlo (5) korsên fêrkirina zimên bi dawî kir . Li 1 . 8 .2012 an û 14 . 8 . 2012 bi rêweresmên ahengî , bi başdariya şanda kenalê " Gelê Kurdistan " fêrname li (35) şagirtên serkeftî belav kirin. Herdu aheng bi kêlîkek bêdeng li ser giyanên Şehîdên azadî û rûmetê di gel Sirûda " Ey Reqîb " dest pê bû û gotina rêvabiriya rêxistina Qamişlo ya S .F . P . Z . K.S û gotinên mamostên korsan hatin pêşkêşkirin.

* Li 16 . 9 .2012an , li herêma Efrînê, li gundê Şadêrê, Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî , bi başdariya girseyek gel û bi dehan ji mamostên zimanê kurdî û rewşenbîrên mîna Dr. Ebdilmecît Şêxo û Dr. Mihemed Enwer, fêrname li (123) şagirtên zimên ên serkeftî belav kirin.

Aheng li kat pênc piştî nîvro , bi kêlîkek bêdeng li ser giyana herdu nemiran celadet Bedirxan û Qanatê Kurdo dest pê bû . piştre ,du keçikên biçûk "Diljîn û Besmê" helbestek bi navnîşana "zimanê min" pêşkêş kirin . Dûre , nivîskar û helbestvan "Merwan Berekat" gotina saziyê anî zimên . Di gotinê de , li ser giringiya zimên di şaristanî û jiyana miletan û parastina nasnama netewî de rawestî . Paşê jî mamostê zimanê kurdî , endezyar "Mihemed Tobal" , gotina mamostên zimanê kurdî li "herêma Robariya û gundê Merestê" pêşkêş kir . Gotina mostên zimên li gundên "Îska , Şadêr , Xezîwê û Basûtê" , mamostê zimanê kurdî "Sedîqe Îbo" xwend . Keça hêja "Efrînê" jî , helestek ji helbestên helbestvanê mezin "Cegerxwîn" pêşkêşî beşdaran kir. Gotina dawiyê ya piştgiriyê ya "Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd" bû , birêz "Ednan Îbo" pêşkêş kir. Û weha bi kêf û xweşî aheng hate bidawîkirin .

www.arsivakurdi.org

# P.Y.D.K.S û vekirina navendan

li ber roniya biryara komîta rêvebir di dermafê vekirina navendan de, di siya heyama şoreşa Sûrirê de , û bi taybetî piştî damezrandina Desteya Kurd a Bilind, partiya me dest bi vekirina navendên xwe dike , û bi vê gavê derbasî qonaxeke nû ji xebata aşkere dibe:

Roja pêncşemê 2-8-2012 li bajarê Efrînê , roja yekşemê 12-8-2012 li bajarê Helebê (taxa Eşrefiyê) , roja Înê 24-8-2012 an li bajaroka Badîna, roja Înê 31-8-2012 an li bajarê Reco , roja sêşemê 11-9-2012 an li bajarê şiyê , roja Çarşemê li bajaroka Meydankê 3-10-2012an, û li roja Înê 5-10-2012 li bajarê Cindirêsê, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, bi rêweresmên şaristanî û bi beşdariya bi hezaran ji gelê me yê Kurd , heval û dost , Kesayetiyên serbixwe , çi Kurd çi Ereb , nûnerên partiyên me yê Kurd , komele û saziyên sêvîl, û bi taybetî nûnerên herdu Encûmenên me yên Kurd navendên xwe vekirin. Belkîm di rojên werin de , navendin din jî werin vekirin .

Di vekirina hemî navendan de , gotina partiya me , gotina Encûmena niştimanî ya Kurd , gotina Encûmena Gel a Rojavayî Kurdistanê ji bilî Reco-, gotina rêxistina me li wê deverê-ji bilî ya Helebê-, Herweha gotina komela Rewşen Bedirxan a jinên Kurd , gotina rêxistina parêzeran a partiya me li Helebê , saziya zimanê kurdî û hin gotin û helbestên ji vir û wir li hin ciyan pêşkêş bûn.  bi awakî serkeftî , rêweresmên vekirina wan navendan bi dawî bûn.













www.arsivakurd.org

# Gilî û gazinên zarokekî

**Enehîte Mûrad**

Vaye dora du salan e, ku şoreşa Sûriyê dest pêkirî û hêjî ne xûya ye, ku kîngê wê bi serkeve. Encama vî temenî dirêj, pir êş ,serpêhatî , pirsgirêk û asteng di jiyana gelê Sûriyê de, hewş vedide . Vêca jî , xelkê Sûriyê bi şev û roj xemxwarê doza şoreşê ne, nemaze zarokên nazdar ku bêhitir bi şoreşê û kiryarên vê rijîmê re mijûl dibin . Lewre jî ,pir êş û janên dijwar di hundirê me de mezin dibin . Ji ber ku, jiyana hêmenî ji lîstik ,ken ,şahî , seyran , dibistan û H.W.D winda kirine , tenê zarokên Sûriya me îro di heyamên bive de , penaberî , kuştin , talan , wêran , tiris û her tişt li pêş çavên xwe dibînin . Ango jî , hiş û ramanên zarokên Sûriya me, ji temenê wan mestir in . Weke nimûne : Ji berî çend rojan min serlêdanek ji dosteke xwe re çêdikir , piştî pirs li rewş û halê wan, wê destûr dixwest ji bo çêkirina qehwê. Di wê karnavê de ,zarokê wê yê pênc- şeş salî, ku dostanî di nêvbera me de hebû, wisan jî weke hercar, min ew hembêz dikir , pê şadibûm,û li rewş û halê wî dipirsîm.Lê, pêlên xemgîniyê li ser rûyê wî baş diyar bûn . Ronî bi melûlî û keserên kûr li min dimeyzand û weha digot : Rewşa min ne baş e, ez ji vê jiyanê heznakim , lewre jî , ji berî kes min bikuje an jî dîn bike, dixwezim bimirm, belkîm dema ez bimrim ji vê rewşa koletiyê azad û rizgar bibim . Min bi şêtmayî guhdarî gotinên Ronî dikir raman û gotinên wî mîna xortekî bîstsalî bû . Bi dilovanî min hembêz kir û weha jê re digot : Delalê min tu çi dibêjî jiyan bi hebûna zarokan pir xweş e, ji ber ku zarok bi xwe jiyan in . Ronî bi sixêf û kerb, xwe ji hembêza min davêt û li rex min disekinî, dest û lepên xwe dihejandin û digot : Bi Xwedê Beşar Elesed bê hiş e , sed nehle li wî were ,ku şer û ceng li dar xistî û bê fedî û şerm zarokan dikuje.Tu kes nikare me ji hovîtiya wî rizgar bike ,ya Elah ji bo çi ev ceng ? Bi Xwedê, ez dizanim ,ku li dawî ewê şermezar, riswa û rezîl bibe!! Pişt re, hêdî –hêdî ew ji kerba xwe dadiket û bi gavên giran berve min dihat, bi dengekî nizim ji min re digot : Tu soz didî min ,ku gotinên min ji tu kesî re nebêjî ,nemaze diya min . Bi rûkî berkenî min ew hembêz dikir û destê xwe di ser serê wî re dixuşand û jê re digot : Bi soz û peyman tiştên tu bêjî, ez ji tu kesî re nabêjim nazdarê min. Tu baş dizanî ku çiqas ji te hez dikim. Hîngê pêlên rihetiyê li ser rûyê wî ava dibûn û wî weha digot: Bi Xwedê, nizanim çi bikim? Pir caran dixwezim ji malê bazdim ,vaye bêtirî heyvekê ye ,ku bavê min dûrî malê ye , ez pir bîriya wî dikim, ji dengê top ,qurşîn û him-hima balefirokan ditirsim xewkim û dema radizim, xewnên bi tiris dibînim . Ez çi bêjim, hovîtiya Beşar ne bes e ,bi ser de jî kotek û lêdana diya min. Ma tu dizanî ku ev mal li ser min bûye hebis û zîndan. Nikarim bilivim diya min tim û tim dibêje dengê xwe neke , melive , huske, ezê te bikujim. Wî bi kelgirî gotinên xwe berdewam dikirin , bi Xwedê diya min jî mîna Beşar Elesed hovîtiyê li serê min dike, min har û dîn dike, û ez çawa bikim ,ew kotekên xwe ji ser min kêm nake bi sûmsiq, kulmist , şekal û sîlan jî li ser devê min dixe û dibêje eger tu ji tu kesî re bêjî ezê te bikujim. Ev rewşa min e, de ka bêje ez çi bikim ? Hingê agir bi dilê min diket, min ew radimûsand û weha jê re digot : Kurê min ! Heyfa zarokekî mîna te ,ku êş û janên te ji temenê te pir mestir in. Lê mixabin, ev rijîma setemkar, sedema bingehîn e ji hemû asteng û pirsgirêkên me re, û dawiya zorê rûreşî ye .

www.arsivakurdi.org

# Duwem salvegera koçkirin Serokê Partiya me birêz Ismaîl Umer

Îro, roja Pêncşembê 18.10.2012an, li ser daxwaza Rêxistina Cizîrê ya partiya me, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê-YEKÎTÎ- bi sedan heval, hogir û dostên Partiyê digel beşdariya hin rêxstinên Kurd ên bira, bi gul, kulîlk û çîçekan li ser gora nemir, mamoste Ismaîl Umer li gundê Qereqoyê civiyan. Birêz Eliyê Remî xêrhatina beşdaran kir û bêhnek bêdeng li ser giyana xebatkarê gelê me û rewanê hemî pakrewanên Kurd û Kurdistanê û yên şoreşa Sûriyê rawestiyan. Birêz Zerdeşt Mihemed-endamê komîta rêzanî ya partiya me, bi zimanê Kurdî gotinek pêşkêşî beşdaran kir.Deqa gotinê ev bû:



*"..Îro, em hemû bi hev re li vir kom bûne ,da ku em mamoste Ismaîl Umer û hemû pakrewanên şoreşa azadî û rûmetê li Sûriyê bi bîra xwe bînin…Ez dixwazim bêjim ,ku mamoste Ismaîl Umer ne tenê serokê partiya me bû û hew, lê belê, ew bi nernî û bîr û baweriyên xwe pirojeyeke siyasî bû. Çûna wî ya lezgîn, ne tenê ji bo me, lê belê ji bo tevgera me Kurdî û niştimanî bi tevayî zirareke mezin bû….Armanca serke ya wî û partiya wî, yekrêziya tevgera netewî ya Kurdî li Sûriyê bû. Ji ber ku, ew xwediyê wê baweriyê bû, ku bi vê rewşa perçebûna tevgerê, em nikarin rola xwe bilîzin û ji doza gelê xwe re bibin nûner. Bo wê baweriyê jî, herdem ji bo avakirina lêvegerek Kurdî xebat kiriye.*

*Îro, di vê bîranîna dilêş de, em dikarin mizgîniya pêkanîna armanca wî ji giyanê wî yê pîroz re bişînin û bibêjin, li ser wê riya ku te canê xwe di ber de fîda kiriye û kula wê bi te re çûye gorê, me gavine berfireh li ser avêtine, bi hêvî ne ku hê pêşdetir herin…"*

Piştî wê, Jîna Remî, helbesteke şêrîn bi zimanê erebî j beşdaran re pêkêş kir. Paşê, mamoste Şerîfê Binxet gotina Encûmena niştimanî ya Kurd li Dirbasiy xwend û mamoste Dilawerê Zengî gotina Dezgeh Ismaîlê Emo ya Çand û Civaka Kurdî bi zimanê dayik xwend û ev e deqa wê ye:

**Beşdarên hêja û delal**
**Malbata nemir ya rêzdar**
**Endamên Partiya Yekîtî a Demoqrat a Kurd li Sûriyê .**

Berî du salan,di rojeke wek roja îro de,me peyakîekî gewre, xebatkarekî hêja,siyasetvanekî zîrek me ji nav xwe wenda kir. Ew xebatkarê me nemir bavê Şiyar bû. Bavê Şiyar dora pêncî salî - ji ji gelê xwe yê Kurd re xebitî ye. Bê cangiranî û bê rawestandin tim li rêz û benda eniya pêşî bû. Berketiyê yekîtiya tevgera kurdî bû. Xwedîiyê ramana azad û karê baş bû. Mirovekî rastgo û bi bawer bû.Hevalê hevalê xwe bû.Ne keysebaz û pergîr bû. Xebatkarekî dilsoz bû.

Bêguman, koçkirina nemir di van rojên pir teng û dijwar de ,cihê dilxemgîniyê ye. Di vê dema ku em j her demê pirtir hewcedarê wî bûn. Lê mexabin, dest l ber mirinê nayê hildan, pir zû ji nav me bar kir.

Em bi navê dezgeha nemir Ismaîlê Emo ya çand û civaka kurdî sersaxiya miletê Kurd, malbata wî û heval û dostên wî dikin. Xwedê wî bi mihderî û dilovaniya xwe şake û cihê wî buhişt be.

**Dezgeha Ismaîlê Emo ya çand û civaka kurdî**
**Elmaniya 18-10-2012**

Hêjayî gotinê ye, ku gelek alavên ragihandinê, berpirsên malperan û kenalên ezmanî beşdarî ahengê bûn û hevpeyvîn bi hin dost û hevalan re çê kirin.

**Dumahîk : Hevpeyvîn**

li darxin, da ku karibin dûv re kongreke netewî serkeftî bînin cî. Ango, gav û komîteyên haziriyê û şêwrê li pêşî bin, da ku piroje berevajî nebe.

- *Balkêş e, ew statukoya ku Rojavayê li ser parçekirina Kurdistanê ava kiribû, îro ji aliyê xeta Rûsya û Çînê ve tê parastin. Hûn veguhertina helwestan çawa dinirxînin?*

- Helwestên dewletan têne guhertin, li gorî berjewendiyên xwe yên aborî û stratejîk, bi şev û roj dixebitin û li ber xwe didin. Jiyan û mafên mirovan û gelan di dawiya lîstekarê dewletan de jî cî bigire baş e. Têkilî, peyman û pêwendiyên di navbera Rojava (Emerîka û Awropa), Rûs û Çîn de, di gelek waran de û li gelek cîgehan, berfireh û zor girîng in. Gelo rol û girîngiya Rûs û Çînê her diçe diçilmise an geş dibe? Vêca di vê dema globalîzmê de, pir zor û zehmet e, siyaseta navnetewî bi serkêşiya tek dewletê be. Û ji ber gelek sedeman, guhertina sînorên fermî yên navnetewî li Rojhilata Navîn wê ne hêsan be. Rûs cîranê me ne, Rûs xwedî dîrok, berjewendî û rolekî balkêş û bi hêz e, herweha rola Çînê di warê aborî û bazirganiya navnetewî de her diçe xurttir û berfirehtir dibe, digel hebûna pirsgirêkên wê yên hundirîn. Dixwazim bêjim: Dem di ser xetên reş û sipî re borî ye, siyaseta navnetewî piralî û rengîn e.

- *Wek encam, peyameke we ya ku hûn dixwazin bigihîjin raya giştî ya Bakûrê Kurdistanê heye?*

- Spasiya we dikim û ji raya giştî ya Kurd û Turk re dixwazim bêjim ku pêşeroja Sûriyê ne ji rijîma Bais re ye. Bi hêviya ku ew penaberên Sûrî -çi Kurd û çi Ereb- ên ku koçber bûne û gihane Turkiyê û hinde gund û bajarên Kurdistanê, nêzîk dê vegerin malên xwe. Heta wê hîngê, çavên we li wan bin. Û sipas.

**Hevpeyvîn: Azîz Mahmût Ak***
**Rojnama Newroz – hejimar 221 – 28 Eylul**

# Ala Rengîn

Ala rengîn cara yekê di destpêka sedsala bîstan de diyar bû, patiya " Xoybûnê" li kurdistana Îranê cara yekê bi kar anî. Li meydana Çarçira, li sala 1928an, ev al ji aliyê amojgeha zanistî ya kurdî ve, li Parîsê hate belavkirin. Li sala 1946an, bû aleke fermî ji komara Mihabadê ya Kurdî re li Îranê û yazde heyvan berdewam kir. Lê, ev al li Turkiyê, Sûriyê û Îranê hate qedexekirin . Sê rengên alê hene ( Sor : Nîşana fedekarî û xwîna pakrewanên , ku xwîna xwe bo Azadî û serfiraziyê rêtine ye . Kesk : Nîşana xwerist û xwezaya Kurdistana kesk û rengîn e. Sipî : Nîşana aştî û asayê ye).



Ew hersê reng bi şêwayekî asoyî hatine ristandin . Di ortê de , rojek bi rengê zer heye , olên Kurdan ên kevnar nîşan dide . Bîst û yek tîrêjên rojê hene, hejmara (21) jî, nîşana hejmarên pîroz ên ola Zeredeştî ne, (ola netewî ya Kurdên kevnar ). Herweha hejmara(21), bîst û yekê Avdarê-yanê cejna Newrozê:(cejna netewî yê Kurdan)- nîşan dide. **Jêder : Wîkîpîdiye**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Avabûna…**

nemîne û birûxe. Lê, hêz û teşkîlatên rikberiyê ne li hev in, gelek nexweşî û nakokî di navbera wan de cî digrin. Û mixabin hewildanên bona pêkanîna yekrêziyeke di navbera wan hêz û teşkîlatan de bi ser nakevin, lewre jî ev rewşa aloz, asteng û kûrkirîz dê heta demekê bidome.

- *Hûn Mixalefeta Ereban çawa dinirxînin? Mixalefeta Ereb ya Sûriyê, bi taybetî jî Îxwanî Mislimîn ji bo alternatîfa rijîma BAAS çi pêşniyar dike? Di çareserkirina pirsgirêka Kurd de perspektiva wan çi ye?*

- Îxwanî Mislimîn li Sûriyê partiyeke siyasî pragmatîk e. Bi xêra alîkarî û piştgiriya hinek hêz û dewletên derve bûye xwedî roleke nîvsereke. Di derheqê pêşeroj û têkiliya Dîn û Dewletê de, Îxwanî Mislimîn naxwazin cudabûn hebe. Û di derbarê pirsgirêka Kurd de nêrîn û helwesta wan mijdar û pir bi guman e. Ew bi tevahî pirsgirêka Kurd a netewî dibînin ku pirsa hemwelatiyê ye. Hew zimanê wan dibêje "em hemî bira ne."

- *Desteya Bilind a Kurd ku ji Meclîsa Neteweyî ya Kurdên Sûriyê (ENKS) û Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê (MGRK) ava bûye, pêşniyarên wî yên çareseriyê çi ne?*

- Avabûna Desteya Bilind a Kurd (DBK) li ba gelê Kurd li Sûriyê mizgîniyeke balkêş bû, îro jî ciyê pîrozbahî û piştgiriyê ye. Kar û barê DBKê ewe ku yekrêziya kutla cemawerî ya Kurd li Sûriyê bi cî bike, rewşa aram û aştiyane li herêmên Kurdî bi parêze, da ku herêmên Kurdan di vê qonaxa aloz û tevlîhev de nebine cîgehên pevçûn, xwînrijandin û bombebarankirinê. Nemaze bi deh hezaran êl û malbatên birayên me yên Ereb ên ku koçber bûne, îro di nav Kurdan de bi cî dibin û dijîn, û xelkê me yê Kurd wan hembêz dike. Baweriya me ewe ku, çendî rewşa aram û aştiyane di herêmên Kurdî de bête parastin, ewqas ji serhildan û pêşeroja Sûriyê re baş û bi sûd e.

- *Gava ji bo çareseriyê "Ji Gelên Sûriyê re Demokrasî, Ji Kurdan re Federasyon" were pêşniyar kirin, yanî gava Kurd, Erebên Nusayrî, Sûnnî û gelên nemisliman di bingeheke federal de werin cem hev, wê ev perspektîv çareseriyê bîne?*

- Sûriye taybetmendiyeke xwe heye û zor awarte ye; modêla çareseriyê ne zelal e û Sûriye nabe Iraq. Tiştê herî zelal ewe ku rijîma yek-partî û Erebîtiya şovenîst ji hev bikeve û bi dawî bibe, xwînherikandin îro ji berî siba raweste. Û hemî hêz û dewlet li xwe vegerin, da ku li pirojeyeke navnetewî xwedî derkevin û li ser riya pêkanîna çareseriyeke siyasî ji rewşa Sûriyê re gav bêne avêtin.

- *Tê gotin ku di navbera rojên 19 û 22-yên Tîrmehê de, gelê Kurd li bajarokên Kobanî, Dêrika Hemo, Efrîn û Amûdê desthilatdariyê bi dest xistine? Li ser tiştên ku li Rojavayê Kurdistanê diqewimin hûn dikarin çi bibêjin?*

- Karmend û berpirsiyarên dewletê ji neçarî, berê xwe guhertin û ji hinek herêmên weke Dêrik, Kobanê û Efrînê (Kurdax) bar kirin. Rijîma dewletê di warê birêvebiriya kar û barê hemwelatiyên xwe de ne xemxwar e, ew di rewş û qonaxeke zor hesteyar de ye û berê wê bi hemî hêzên xwe li Şam, Heleb û cîgehên leşkerî yên stratejîk e.

- *Di nav van şertan de, bi armanca hevkariya çar parçeyên Kurdistanê, hûn li ser hewcedariya civandina Konferansa Neteweyî dixwazin çi bibêjin?*

- Pêwist e, û pirseke mafdar û rewa ye, ku nûnerên tevgera azadîxwaz a Kurd li her çar parçeyan li hev bicivin û pêşî konferensên şêwrê **D.R.( 6 )**

www.arsivakurd.org

# CEBRAÎL (*)
## HÎTLER, STALÎN, MÛSOLÎNÎ, ÇORÇIL Û MASIYÊ ZEFERÊ


SAL 1
HEJMAR 4
ÇARŞEMB
1 TÎRMEH 1942
RONAHÎ
ANNEE 1
NUMÉRO 4
MERCREDI
1 JUILLET 1942
SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

Gelek caran gava îşê yekî hebe an tiştekî wî winda bibe diçe nik falçî an remildarekî û li fala xwe dide nihêrtin. Ev ji bo mirovine adetî ye. Lê herçî serekên vî şerî nikarî bûn li xwe deynin û herin cem falçîkî. Ji lewre çûn ba Cebraîl û jê pirsîn: gelo kî ji me her çaran vî şerî wê bibe serî û bigehe zeferê?.

Cebraîl di keviya bêrmekê de rûniştî bû û li masiyê ko di nav bêrmê de diçû dihat temaşa dikir. Milyaketê salxwirde, sere xwe hilda û gote wan:

- Yê ko ev masî girt û ji avê deranî ewê zora hemiyan bibe û bigehe zeferê.

Mûsolînî hema ji hindav de rabû, xwe şidand, mehmûzên çîzmeyên xwe li hev da, û bi silaveke faşistî qesta pêş kir û wek denekî xwe berda avê. Bêrm fireh, av kûr û masî jî mezin bû.

Dûçe li avê welê gêr bû ko li xwe wergeriya û her du lingên wî li rûyê avê xuya kirin. Bû keftelefta wî. Ji Hîtler ne

biwa ew tê de difetisî. Dor gihaşti bû Hîtler.

Rêberê elman firehî û kûrahiya avê pîva, giraniya avê da weznê û di derenceyê re daket bêrmê û berê xwe da masî û ew ajot heta cihekî teng. Li wê derê bi her du baskên xwe li masî hate were ew xiste nav çemberê û girt. Hîtler masî di himbêza wî de di derencê re bi hewa ket. Lê dema gihaşte pêpinga paşîn lingê wî şemitî , li xwe qelibî û msî ket avê.

Stalîn got ev îşê min e, hêz da xwe û wek rawirekî li avê raperî û dirêjî masî kir. Masî jê tirsiya, baskên xwe vekirin û wî jî ajote ser Stalîn, bû şerê wan. Masî rahişte simbêlên Stalîn û bi perçekî goşt nîvê simbêlên Stalîn rakir. Stalîn destê xwe danî ser birîna xwe û ji avê derket.

Her siyan li hev nihêrt. Yekî got: Ma Çorçil li kû ye? Dor gihiştiye wî bila ew jî xwe biceribîne. Lê geriyan, Çorçil di quncikekê de, xwe li keviya bêrmê pehin kiri bû û bi kulmekî xwe ava bêrmê vala dikir!!.

**(*) Ji Kovara RONAHÎ hejmar 4- Çarşemb 1ê Tîrmeha sala 1942an**

*********************

# Destên sipî yên Kurd

Li 17 .9.2624k – 2012 z giropek ji xortên me yên Kurd li Heleb, li hev civîn . Piştî donûstondnekê bi hev re , dîtin ku têkeldariya wan bi hevdû re , bi awakî rêxistinkirî zor girîng e , ji ber wê nav li xwe kirin ( D. S .K ) û rêvebiriyek ji xwe re hilbijartin. Herweha hêza xwe kirin xizmeta Desteya kurdî ya bilind . Di wê civînê de ,Çalakiyek dane berxwe .Ew Galakî danesera pagijiyê ji herdu taxên Eşrefiyê û şêxmegsûd re, di bin Sîwana ( D.K.B) de, û bi alîkariya ( E.N.K.S ) û (E.G.R. ê) bû . Danesera pagijiyê ji 21.9 .2012 roja înê ,li kat ( 9 ) ê sibê , li dawiya Eşrefiyê dest pê bû .

www.arsivakurdi.org

\

# Kurmê darê ji darê ye!!

**Rêberê Silîvî**

Li darê dinê, tu kes mîna me Kurdan dilpak, dilsoz û belengaz tune ye. Ji stranên foklorî û rûpelên dîrokê tê zanîn ku zû em bi çiv, vir û derewên xelkê hatine xapandin, azadiya xwe winda kiriye û me baca wê xwîna dilê xwe daye. Baweriya me bi virên wan hatiye, ji wan bawer kiriye û bûne qurbaniyên kîn û zikreşiya wan. Weke mînakeke dilêş, li rojhilatê Kurdistanê, Riza Behlewî yê farisî digel dora sed siwarî dikeve qevda Simko Axayê Şikakî. Tevî ku ew neyarên hev bûn, bi hev re di şerekî giran û dijwar de bûn jî, Simko Axa ew aniye mala xwe, bi şîv, xwarin û vexwarin kiriye û xinizî pê re nekiriye. Lê, em tev dizanin çawa ku dema keysa Riza lê hatiye, dema jê re şandiye ku ji bo çareseriya doza kurdî ,ew dixwaze wî bibîne û diyalogê pê re bike.Di heman demê de, ji bo kuştina wî pilan daniye, leşkerên xwe di newalekê de li pêşiya wî veşartine û bi xinizî wî serokê Kurd ê payebilind kuştiye, li seranserî Îranê bûye şahî û li Kurdistanê jî şîn û girî…!! Herweha, Dr.Ebdurehaman Qasimlo, Sadiq Şerefkendî û gelekên din bi dek û dolabên neyarên gelê me hatine kuştin.

Dema tu bixwazî malbatekê ji hev belav û taromar bikî, gumanê berde wê malbatê!!...Nema baweriya kesî bi kesî tê, her endamek xwe mîr û mezinê êlê dibîne, li gotina mezinên xwe guhdar nake, neyar nexweşî, bêbawerî, belavbûn û mirina reş tê de cîwar dibe. Di dîroka gelê me de gelek nimûneyên balkêş di vî warî de hene, yek ji wan: Dema Imperatoriya Osmanî û Sefewî ji bo şer û tunekirina Kurdan xwe kirine yek, Kurd şikandine, Xanoyê Çengzêrîn digel efser û serleşkerên xwe di kela Dimdimê de ,berevanî û pêdarî kiriye, dike nake nikare derbasî wê asêgehê bibe. Di tariya şevê de, xinizekî Kurd xwe digihîne neyaran û ji wan re dibêje: Xano gelek zad, qût, xwarin û vexwarin ji bo rojên wilo hilaniye, bi şer jî hûn nikarin kelê bigrin, lê ez dizanim hûnê çawa kela Dimdimê dagîr bikin!!.. Jê dipirsin çilo, çawa …Ew dibêje: Herin kaniya avê gemar bikin, ewê ji têhna bimirin, hûn ê Xano mîna kewekî bigrin!!!..Wilo dikin û kelê zeft dikin lê xweşmêrê Kurd Xanoyê Çengzêrîn xwe dikuje û bi saxîtît xwe naspêre neyaran!!. Bi vî hawî, Yezdînê şêr jî şoreşa Bedirxaniyan şikandiye. Herweha gelek êl û eşîrên Kurdan li hember şoreşa Şêx Seîdê Pîran şer kirine, ji Ataturk re bûne peyane erzan û şoreş Kurd a pîroz têk birine, paşê Mustefa Kemal serê hina ji wan firandiye û hin jî bi werîsên sêdaran xeniqandine. Ango mirov dikare bibêje kurmê darê ji darê ye û her em ketiyên nezanî û bê tîfaqê ne, nezanî û bê tîfaqa me bûye buhara dilên neyarên hebûna me.



Şemî 18.08.2012

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Sûriye ‚şoreş..**

mezin heya nuha nikarîne li hev bikin, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî jî heya îro nikariye helwesteke xurt bigirta, da ku bi yekdengî têkilî rewşa Sûriyê biba, şer bida rawestandin û ji Sûriyê re çareseriyek bidîta.

Li dawiya dawî nuha şerekî wisa li Sûriyê pevketî, ku ne rijîm, ne jî xelkê Sûriyê êdî nikarin bi tenê wî vemirînin. Ev şer rojane bi dehan xelkê bêguneh ji xwe re dike ardû û sotemenî. Eger sazî, hêz û dewletên mezin ên cîhanê herwekî hinek dewletên herêmê li hev nekin û ji kêşeya Sûriyê re çareyekê nebînin, rewşa Sûrîyê dê hîn kambaxtir bibe û ne dûr e ku akam û ziyana xwe bigihîne welatên derdora xwe jî; nemaze jî Lubnan û Tirkiyê (ne dûr e Îraq jî).

Ev yeka hino- hino ji dewletên Rojhilata Navîn re, her weha ji dewletên mezin û cîhanê re dibe baweriyek. Mera pê hest dike ku hin aliyên navnetewî nuha bi amadekirina "plana B" (planeke nû) mijûl in, da ku hem xelkê Sûriyê ji vê dojehê biparêzin, hem jî herêmê ji şerekî demdirêj û sawdar biparêzin.

Vêca dem hatî ku her kes, yê ku xwe berketiyê mirovatiyê dibîne, hewla wê yekê bike û ji bo wê yekê kar bike ku di zûtirîn dem de ev şer (aşê mirovên bêguneh) bête rawestandin, nexşeriyek ji veguhartina (rûxandina) rêjîma Esed re bête amadekirin û bîrdoznameyek ji Sûriya pêşerojê (dahatûyê) re bête danîn. Bi baweriya min divê ew bîrdozname li ser bingeha rastiyên dîrokî û erdnîgarî, her weha li ber ronahiya rastiyên îro heyî bête amadekirin, da ku ji aliyê siyasî û rêveberî de asoyine nuh li pêş Sûriyê veke û Sûriyê bibe welatekî demokrat ku tê de hemû mirov û pêkhateyên netewî û olî azad û wekhev bin; welatek ku hem hilbijartinên serbest tê de hebin, hem jî desthilatî û tekrewiya piraniyê li ser yên din nehêle. Ne jî elewî, durzî û xirîstiyan bikevin bin zora tundrewiyeke olî ya ku kesekî din napejirîne. Gelê Kurd jî divê mafên xwe yên netewî wek gelekî li ser xaka bav û kalên xwe bi des bixe. Ev hemû jî, tenê di dewleteke weha de gengaz e, ya ku sîstemeke nenavendiya siyasî ji xwe re bike bingeh. Ango divê Kurd, Erebên sunî, elewî û durzî li ciyê ku piranî ne karibin herêmên federal, encûmen û hukûmeta xwe ya herêmî ava bikin. Bêguman divê xirîstiyan jî li seranserî Sûriyê (ji ber ku ew ne tenê li herêmekê ne) xwedî mafên xwe yên olî bin û li wan tu stem nebe.

Eger mirov bixwaze rastiyê bêje, çareserî ev e.

* **Endamê Serkirdayetiya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - Yekîtî**

# Pîrozbahî

Sekretêr û hemî endamên partiya yekîtî ya demikrat a Kurd li Sûriyê –YEKÎTÎ-

Silav û rêz

Di van dem , nîrên û hestewer de, evên ku şoreşa Sûriyê tê de roj bi roj dupat dike, ku qelenê azadiyê çiqas buha û bilind be jî, gelên Sûriyê xwe ji ber dana wî qelenî nadin alîkî, belê vaye didin û dê bidin jî, ta ku tava azadiyê û rûmetê seranserî Sûriyê digire.

Gelê me yê Kurd jî ji roja pêşî de mohra xwe li eniya şoreşê daniye, û rojekê ji pêdiviyên xwe nema ye, teqez dê ji destkeftiyên şoreşê bê par nemîne, lê wek hûn jî dizanin, bi destxistina wan destkeftiyan bê xebat û lebat nabe.

Di vê qoziyê re, ez vekirina bûrowa partiya we, ev partiya, ku rojekê ez di nav refên wê de dixebitîm, dinerxînim, pêre jî hêviyên min bi partiya we geş dibin, û baweriya min dupat dibe, ku ev partiya, ku di dema xebata nehênî de ji erkên xwe nedima, dê di dema xebata eşkere de bêtir çalak be.

Bi hêviya ku em careke din li welêt pêrgî hev bibin, ez vekirina bûrowa we li Efrînê pîroz dikim.

Heyder Omer

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk: Avabûna …**

xalên balkêş tête nasîn:

**1**- Xwedî programeke siyasî, rêzname û sond e. Bi rêbaz û şêweyên demokratîk kar û xebata xwe bi rê ve dibe.

**2**- PYDKS li seranserî herêmên Kurd li Sûriyê cîgirtî ye û xwedî piştgiriyeke civakî ye. Ji bilî rêxistinên partiyê, li bajarên mîna Şam, Heleb, Hesekê, Reqa, Til-ebyedê û li zanîngehan cîh digire. Bi ser de jî, hebûna rêxistinên heval û hogirên partiyê li bêtirî 13 welatên Awropî digel Siûdî Erebistan, Turkiyê, Libnan û Kurdistana Îraqê…

**3**- Partiyeke serbixwe, xwedî têkilî û dostanî ligel piraniya rewşenbîr, hêz û kesayetiyên siyasî yên Sûrî û Kurdistanî ye. Xwedî semboleke fermî û durişma **"xebat ji bo aştî, azadî û wekhevîyê!"** ye. Doz û daxwaza partiyê, pêkanîna çareseriyeke demokratîk bona pirsa netewî ya gelê Kurd li Sûriyê ye. Tund û tûjî, şêweyên çekdarî û xwînherikandinê napejirîne. Di wê baweriyê de ye ku, riya herî rast bona çareserkirina hemî pirsan, riya diyalog, gotûbêj û şêweyên aştiyane ye, da ku dijayetî û kîndarî kûrtir nebin, xizanî û nexweşî berfirehtir nebin, mafên mirovan û gelan di vê sedsala 21-an de bêne naskirin û binpê nebin.

**4**- Bona pirsgirêka Kurd li Sûriyê, parastina berjewendiyên pêvajoya civakî, aborî û zaniyarî di civak û herêmên Kurdî de û pêkanîna heyameke demokratîk li Sûriyê, PYDKS dibîne ku çareserî di pêkanîna cîbecîkirina daxwaza birêvebiriya xweser (Îdara Zatî) di çerçewa parastina yekitîya Sûriyê de ye.

**5**- PYDKS xwedî kovareke mehane bi Erebî bi navê "El-wihde-Yekitî" û ya du mehane bi Kurdî bi navê NEWROZ e, digel piştgirî û lixwegirtina kovara PIRS ya demsalî bi Kurdî û kovara "El-hîwar-Diyalog" ya bi Erebî ya demsalî û ji sala 2006-an ve xwedî malper e: www.yek-dem.com. Tevî ku ji hîngê ve, li Sûriyê vekirina vê malperê qedexe ye û xwendevan nikarin rûpelên wê vekin.

- *Di derheqê bûyerên ku li Sûriyê diqewimin hûn dikarin bi giştî çi bibêjin? Partiya we qonaxê çawa dinirxîne? Di bingeha berxwedan û serhildana gelên Kurd û Ereb de çi heye?*

**-** Ji sala 1963-an de Partiya Baas bi baskên xwe yên cûrbecûr, bi navê 'şoreş'ê û berjewendiyên karker û cotkaran, Erebîtî û sosyalîzmê û H.W.D desthilat û karbedest e û ji hîngê ve, rijîma dewleta Sûriyê di bin bandor û serkêşiya leşkerî de ye. Vêca di siha rijîma yek-partî de hemî rê û deriyên kedxwerî û malxweriyê vebûbûn, rê li pêş jiyana siyasî xetimî bû, karê partî û sendîqan, rewşenbîr û hunermendan, mafên bingehîn ên mirovan serûber dorpêçkirî û kambax bû... hwd. Eve 18 heyvin li piraniya herêm û derdorên bajar û bajarokên Sûriyê, karbedestên rijîma Baas xwepêşandanên gelêrî, bi tund û tûjiyeke bêhempa bersiva gelê Sûriyê dide. Ne tenê girtin û kuştin, lê belê bombebarankirina bi tanq û topan, bi balefir û hinde çekên giran, komkujî di derheqê mirovên sivîl û bêguneh de, berfirehtir dibe. Vêca, li beramber vê yekê, rikberiya (mixalefet) çekdar jî têra xwe bi çalakiyan radibe, û bi alîkariya hinde hêz û dewletên derve, teşkîlatên çekdar ên hinde baskên rikberiya Sûriyê, bi roleke germ radibin û bersîva rijîmê bi şêweyên germtir û hovane tête holê. Û xelkê sivîl li ber lingan diçe û dibe qurban. Lewre, em dikarin bêjin, qonaxa ku îro Sûriye dijî, berê wê xetimî û nediyar e. Ango ketiye tariyê û bêguman rijîm di ber de berpirsiyar e.

- *Li Sûriyê krîza siyasî kûr dibe. Rijîma BAAS hîn di ber xwe dide, hêzên mixalîf û gelê Kurd jî ji bo guhertinê bi biryar in. Wê krîz çawa çareser bibe? Gelên Sûriyê bi dînamîkên xwe dikarin rijîmê birûxînin? Hedefeke wisa ya yekgirtî heye?*

Hêviya xelkê Sûriyê bi tevahî -çi Kurd û çi Ereb- ewe ku rijîma Baas **D.R. ( 7 )**

www.arsivakurdi.org

# Sûriye, şoreş û pêşeroj

**Dr. Kamiran Haj Abdo***

**P**iştî dora 48 salan ji sîstema tekpartîtî û tekrewiyê, piştî 48 salan ji binpêkirina mafên mirovan û azadiyên bingehîn li seranserî Sûriyê û piştî ewqas sal ji siyaseta şoven û projeyên nijadperest di dermafê gelê ‹urd li Sûriyê de, xelkê Sûriyê serûber serê xwe li hember rêjîma Esed ya tekrew, dîktator û şoven hilda. Destpêk roja 15.03.2011-ê bû. Dawî jî mixabin hîne ne diyar e. Di pêvajoya van 17 heyvan de bêtirî 27000 kes hatine kuştin û bêtirî 200000 kes girtî û wenda ne, dora 167000 kesî jî li welatên derdorê derbeder bûne. Xelkê Sûriyê serûber jî bûye dîlê êş û cefayeke mezin û toşî rewşeke zor zehmet dibe.



Weha xuya ye jî ku ev rewşa dijwar dê hîn berdewam bike. Belkî hinek nexwazin bawer bikin, lê bi baweriya min rastî ev e, tevî ku tehl e jî. Çima? Ji ber ku rewşa Sûriyê, ev çend heyv in berve şerekî navxweyî çûye. Gem û lîwana wî şerî jî ne bi dest xelkê Sûriyê de ye. Gelek aliyên herêmî û navnetewî di wî şerî de hevpişk in. Mirov dikare bêje ku çawa xelkê Sûriye di vî şerî de bûye du beş (hêza rikber li aliyekî, rêjîm li aliyê dî) weha jî herêma Rojhilata Navîn û Cîhan jî di vî şerî de bûne du beş. Turkiyê, Si'ûdiyê û Qeter, herweha jî Amerîka û Ewropa piştgiriya rikberiya Sûriyê dikin (lê her hinek ji wan rengekî rikberiyê ku li gor kêfa wan e). Li hemberê Îran, Rûsiya û Çîn li pişt rêjima Esed in. Ji vê xerabtir hin welatên cîran weke Îraq û Lubnanê jî di vî şerî de bûne du "perçe": Hukûmeta Federal ya Îraqê û Hizbollaha Lubnanê piştgiriya rêjîma Esed dikin; Herêma Kurdistanê ya Federel û beşeke Lubnanê jî piştgiriya daxwazên gelê Sûriyê dikin, bona azadî û wekheviyê. Şerê li Sûriyê welatên cîran, herêma Rojhilata Navîn û Cîhan kirine du perçe û ew li ser xaka Sûriyê bi destê sûriyan bi hev ketine. Kêm yan zêda herdu aliyên şer yên Sûriyê (rêjîm û rikberî) di destên wan de bûne kukle (bûkok, pêlîstik, *marionette*). Her yekê ji wan dewletan armancek heye, derdê wan ne ji dûr ne ji nêzîk ne avakirina sûriyeke demokrat e. Her yek ji wan li gor berjewendiya xwe helwestekê digre. Si'ûdiye û Qeter dixazin rol û bandora Îranê li herêmê kêm bikin û li Sûriyê erebên sunnî bêne ser desthilatê. Tirkiye jî ji bo xewnên xwe yên osmanî heman tiştî dixwaze. Bi ser de jî bazareke gewre ji aboriya xwe re amade dike. Meleyên Îranê û Hizbullah jî naxwazin hevbendekî xwe (yê ku di navbera wan herduyan de xelek û grêdaneke girîng e) ji dest bidin. Derdê Rûsiya jî ew e ku dewsa piyên xwe li ber perava Derya Spî biparêze, ji ber ku eger ew wir jî ji dest bide, nema ciyê wê di derya spî de dimîne.

Ji ber sedemên jôrîn dewletên **D.R ( 10 )**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org